



Australian Government
Department of Home Affairs



Kursên Zimanê Inglîzî jibo koçberên xwedan-merc li Australyayê

GUHERTINA XIZMETÊN AMEP'Ê JI BER BELAVBÛNA NEXWEŞIYA KOVÎD-19'Ê

Ji kerema xwe eger halê te nebaş e , seredana navenda fêrkariyê ya AMEP'ê neke.

Li gorî dewama rewşa KOVÎD-19'ê, tevdîrên nû jibo raberkirina AMEP'ê ji wan hînbûna ji riya dûr va û bi awayê Online hatine berçavgirtin.

Jibo gotûbêja derbarê van tevdîrên nû ji kerema xwe bi awayekî rasterast digel [raberkera xizmetên AMEP](#) a xwe bikeve têkiliyê.

Derbarê [KOVÎD-19'ê û nîşaneyên wê agahiyên bi dest bîne](#)

Bernameya Inglîzî jibo Koçberên mezin

Bernameya Zimanê Inglîzî jibo Koçberên Mezin (AMEP) fêrkariya bêpere ya zimanê Inglîzî jibo koçberên xwedan-merc jibo pêvajoyên Vîzaya Mirovdostane, pisportî û malbatê dabîn dike.

RABERKIRINA BERNAMEYÊ

AMEP li 58 nuqteyên têkildar li seranserê Australyayê tê raberkirin û jibo dabînkirina hewcetiyan hînbûna

seredaneran bi riya raberkirina bereyê berfireh ji bijarde û setên hînbûnê ji wan fêrkirina ji riya Dûr va hatiye plandarêştin.

Tu dikarî jibo dîtina nêziktirîn raberkira xizmetan a bernameya xwe li gorî parêzgeh û navçeya xwe seredana malpera [raberkira xizmetên AMEP'ê](#) bikî.

Lêzanînen me yê derbarê AMEP'ê bi zimanên din jî li ber dest in. Jibo wergirtina agahiyên wergerandî bi zimanê xwe, seredana rûpela [lêzanî bi zimanên din](#) bike.

Xwedan-merc bûn

Ew kes xwedan-merc jibo wergirtina AMEP'ê ne ku:

- Niştecihê Australyayê bin
- Li gorî nirxandina kedkarên xwedan-merc ên AMEP'ê derbarê *taybetmendiye koçberan (Asta perwerdehiyê)(Inglîziya Pratîkî) 2017* asta wan a Inglîziya Pratîkî tunebe
- Pêştir li gorî nirxandina Wezaretê karên derve bi mebesta wergirtina Vîzayê (tenê jibo xwediyên Vîzaya perwerdehiyê) asta wan a Inglîziya Pratîkî tunebe
- Sînardariyên têkildarî dema tomarkirina nav û kemilandina navnivîsandinê berçav bigirin (seredana beşa *Heyamên demê ya jêrê bike*)
- Herîkêm yek ji babetên jêrê derbarê wan rast be:
 - Vîzaya wan a hertimî û anjî vîzaya wan a demkî ya bawerpêkirî hebe
 - xwedanê vîzaya demkî ya bawerpêkirî ya diyarkirî li belgeya cûreyên vîzayên demkî bin
 - Berê destûra hatina hertimî an Vîzaya hertimî wergirtibin û bûbin welatîyê Australyayê
 - Heke temenê kesekî bin 18 salî be û herîkêm yek ji dêbavên wî pêştir û anjî niha destûra hatina hertimî an vîzaya hertimî hebe.

Kesên bin temenê 18 salî

Koçber û xwediyên vîzaya Mirovdostane ku temenê wan navbera 15 heta 17 salî ye, asta zimanê Inglîzî yê Pratîkî tunene û hewcetiyên wan bi riya pêvajoyên fêrkariyên yên sereke nayên dabînkirin, renga xwedan-mercê beşdariya di vê bernameyê da jî bin.

Heyama demî

Heyamên demî yê jêrê tên sepandin:

- Navnivîsandin di heyama şeş mehan (jibo kesên bin 18 salî û zêdetir) an 12 meh (kesên bin 18 salî).
- Destpêkirina fêrkariyê di heyama 12 mehan da.
- Kemilandina perwerdehiyê di heyama pênc salan da.

Raberkirên xizmetên AMEP'ê dikarin ji aliyê seredanerên niha û seredanerên pêşerojê va heyamên demî dirêjtir bikin.

Daxwaz bi awayê babetî û li gorî pîvanên *Qanûna (Fêrkirina) Koçberan a 1971*. tên hilkolandin.

Lêmiqatebûna ji zarok

Raberkirina xizmetên Lêmiqatebûna ji zarokan jibo seredanerên AMEP'ê ku zarokên wan ên bin temenê dibistanê hene. Xizmetên miqatebûna ji zarok ji aliyê raberkira xizmetê AMEP'ê va tê organîzekirin û heta radeya mumkin di nêziktirîn cihê kursê da pêk tê.